Kakshar Oremar

Keça Kurd û Qedera Reş!



Herkes hemû sibeha zû ji xewa şirîn radibe û ji bo xweşiya jiyaneke baştir dest bi xebat û lebatê dike. Lê roja çarşemê (21.10.2009an) berî saet 5ê sibê ew ji xewê şiyar kirin ku ber bi sêdara îdamê ve bimeşe. Bi tirseke mezin weke dîna rabû ser piya û bi qêrîn û nalînên dilşewat xatir ji deste xwîşkên xwe yên hocrê xwest. Hemû endamên laşê wê ketibûn lerze-lerzê. Êdî piştî çend saetên din dusya jiyana wê dihate dadan. Hêsirên çavên wê weke barana biharê bi ser hinarkên rûyê wêda dihatin xwarê. Herkes bo wê digirî. Heta gardiyen û serbazên ku hatibûn pey daku helqa werîsê îdamê bêxin stoyê wê. Çimkî herkesî dizanî ku ew bêguneh û dibe qûrbana nakokiyên civaka paşvero, zagonên hişk yên komara îslamî, desthilata wehş û hovên sedsalê li Îranê.

Genc û bedew bû. Di bihara jiyana xwe ya 30an da bû. Rûyê wê yê şikestî, ew mîna jineke 60 salî dida xuyanîkirin. Bêhîvî, dilşikestî, serjêr û bêdeng. Di nêrînên çavên wê da sed daxwaz û hîvî ji me mirovên azad(!?) ra hebûn, lê tikesî bersiva qêrînên wê yên di qirikê da fetisandî, nedida. Hezar êş û elemên vê dinê di reng û rûyê wê da xuya bûn.
Belê ... behsa Suhêyla Qedîrî dikem. Keça bextreş ku di temenê 15 saliya xwe da ji destê bab û xalên xwe bi xortekî ra revî, xwe gehandin Tehranê, lê wî xortî ew terkand û Suhêyla hate xapandin. Ji tirsa kuştinê nedikarî vegere mala bavê xwe. Kete nava kuçe û kulanên bajarê Tehranê û bêîrade û daxwaz ji bo têrkirina zikê xwe her rojeke kete nava lihêfa mêrekî!
Ji yekî bû xwediyê kurekî, lê nexwest ku kurê wê jî weke wê bêxwedî û bextreş be û piştî 5 rojan serê kurê xwe bi kêrê jêkir û laşê wî parçe-parçe kir. Ew girtin û piştî du sala hate qesas kirin.
Ji Sûhêyla yê ra: jiyan, evîn, dayik, bav, mal, zarok û heta bêhinkişandin jî reşin, her tişt li ber çavên wê reşe. Weke qedera wê ya reş ku jiyana wê bi awayekî tirajêdîk bidawî anî.
Di dadgehê da ew wiha axivî:**” Ez bûme qurbana zulim û şidetê, hezar sebeb hebûn ku ez neçar kirim kurê xwe bikujim. Vê civakê ez kirim diz, xazok, qehbe û emrazek keyfxweşiya şevên mêrên heşîşkêş û dermanxwar. Tenê yek ji van sedeman bes bû ku kurê xwe bikujim...”**
Sûhêyla êdî weke keseke serhildêr li dijî wan kesan diaxive ku rêyeke wiha li ber wê vekirine:**” Mêrên ciwan bi bêrehmî û şidetê li dijî min tevdigerîn. Kesên ku bi hemû wateya xwe beredayî ne. Ji kûdera vê jiyana reş bo we biaxivim?. Kîjan para 12 sal bextreşî û reşerojiyên jiyana xwe ji were îzah bikem?!... min ji bo rihetî an jî xelasiya zarokê xwe karekî wiha kir. Min nexwest xwelîserî û bextreşiyên ez têda rastî kurê min jî bên. Vê rewşê tu atife di dilê min da nehêştiye. 15 salî bûm ku ji malê revîm, mêra sûîstimaleke tejî wehşet û hovane ji min dikirin û piştra jî weke destmaleke pîs û bêkêr ez diavêtim kuncikekê. Her carê hezar cara ji berê bêtir bêmal û bextreştir dibûm. Min çawa dikarî vê kîna kombûyî di dilê xwe da, vala bikem? Ma min dikarî wan mêra teva bikujim ku çendeka bi hevra mîna heywana hêrişî min dikirin? Ma çiqas hêza min hebû? Heya kengî û çiqas ezê li jêr siya zulim û piyê van mêran bihatama perçiqandin? çima hingî kesek nebû ku min biparêze? Min fikir dikir ku ji ber peywendiyên cinsî ku**

bi gelek kesan ra çêbibûn, toşî nexweşyên "Aids û Hepatit"ê hatime û vê rewşê ez gelek diêşandim. Bavê min baran û dayika min kevir, tikesê min di vê dinê da nîne..."
Van gotinên S. Qedîrî hemû kesên amadebûyî di dadgehê da neçar kirin ku bigirîn. Dilê herkesî bi qedera wê ya reş şewitî.
Bi qêrîn û feryadek tejî şewat li qazî nêrî û got:" Ez êdî qet nerihet nînim, çimkî êdî xewna wan hovîtî, qetila kurê xwe û dîmenên ku bavê min ji min ra diafirandin, nabînim. Heya kengî ezê bêdeng bûma?! Min ev bêdengî şikênand daku hemû bizanin ka çi bi serê min û kesên weke min tê û çima lêvên me hatine dirûtin? Min ticara nekarî li hemberî van şidet û hovitiyan xwe biparêzim...
Sûhêyla feqîrtirîn û bêkestirîn hemwilatiya Îranê bû ku bênav û nîşan bû qûrbana hezar êş û elemên bêderman li Kurdistan û Îranê...